

Dewlet bi TRT6-ê faîza deynê xwe yê kurdan daye



M.cilgin
NETKURD
Aktuelbûn:10:21 - 11/1/2009

Dewletê ev qanal ji bo kesên ku asîmîle kir vekir. Me pêwîstî bi Televîzyona wan tune. Gelek televîzyonên me hene.

Siyasetmedera kurd Leyla Zana ji alî Komelaya Mafê Mirovan(IHD) ya şaxê Diyarbekirê ve hate xelatkirin. Serokê IHD-ê ya Diyarbekirê Muharrem Erbey got wan vê xelatê ji ber hewldanên Zana yên ji bo Mafê Mirovan û wekî din jî ew di sala 1988an de yek ji damezrênera Komelê bû, dane wê.

Leyla Zana jî di dema merasîmê de axaftinek kir û li ser TRT-şesê jî got TRT şes ne ya kurdan, ya kesên ku asîmîle bûne ye. Zana wisa dom kir " Dema ji her derê bîna xwînê tê, dema em di xewnên xwe de mirinê dibînin û dema qîrîna zarokan têbihîstin, ez nizam ê çiqas rast be ku mirov vê xelatê bigre. Şerê Filîstînê xewa me gîşa revand. Gelê Îsraîl vê heq nake. Ez mehek zêde ye li televîzyonan temaşe nakim. Ji bo TRT-şesê divê ne kêfa me bê ne jî em xemgîn bin. Ji ber ku ev televîzyon ji bo me venebû. Dibêjin 15-16 milyon kurd hene. Ji van 5 milyon asîmîle bûne. Ew jî nikarin bi zimanê xwe bipeyivin. Dewlet deynê xwe dide wan. Dewletê ev qanal ji bo kesên ku asîmîle kir vekir. Me pêwîstî bi Televîzyona wan tune. Gelek televîzyonên me hene. Ev kes bi daxwaza xwe asîmîle nebûne. Ew ji perçeyeke ji vê gelê ne. Îro dewlet tenê fazîa deynê xwe yê kurdan dide."

Ji bo cezayê hepsê ku lê hatiye birîn jî Zana got " hinek kes dertên televîzyonê dibêjin bila bi cehinime here ji vir. Ez jî dibêjim ez naçim. Ez ê li ser erda xwe bimînim. Ezê bi gelê xwe re bim. Weka min soz da heta dawîya jiyana xwe ez ê li vir bim. Heta ez bimrim ez ê li ser axa xwe bimînim."

www.netkurd.org